

Di nivîsandina me ye bakurê Kurdistanê da, çiqas "Kurdên" heye?

Cankurd



Di van salên dawî da, gelek gotar û nivîsên bi zarê "**Kurdên**" di rojname, heftename, mehname û kovar û malperên Kurdên da belav dibin. Eve jî nişana serkeftinek neteweyî ye, hinava mirov vedihesîne, dilê mirov şadike û hîviyêd kurdistanîyan bi manda gelê wan mestir dike. Lewma zimanê dayîk û bavan ji nav zimanên mirovatîyê sîl dibe, û gava zimanek bimîne, neteweya

ku pê dipeyve jî dimîne, naye pişaftin û windakirin.

Ghandin yê Hindin, ku mirovekî zana û mestirîn rêberê Hindistanê bû, gotibû, ku ew gelê zimanê xwe diparêze, kilîtê zindana xwe bi dest xwe xistiye, çi demê bixwaze, dikare ji wê zindanê derkeve.

Em vê dibêjin, lê gava mirov hûr û kûr li van gotar û nivîsên payebilind dinêre, mirov dibîne, ku rastî tiştekî din ye, û pirsek derbas dibe mejiyê mirov, pirsek mezin û girîng:

"-Gelo, çiqas "Kurdên" di van gotar û nivîsan de heye?"

Bo bersivdayîna vê pirsê, me divê lêkolînek zanist a ji dil de li ser Kurmanciya nivîskarêd xwe yê hêja çêbikin. Ev jî karekî ne asan e û demek dirêj dixwaze. Lê pêdiviya me rast pê heye.

Berî niha bi çend salan, min di vî warî da dest bi

bizavek nimûneyî ya biçûk kir, mixabin! Karê ramiyarî gelek caran mastê mirov tirş dike û bergeha xebatek wêjevanî û zanistî li ber mirov teng dike. Min ew kar ne bir serî. Niha jî dînsa bergeh çênabe, lewre ezê bi kurtî û wek nimûne hinek gotar û nivîsên, ku di hinde heftename û malper û mehnameyên Kurdên de belav bûne, yê nivîskarên me yê bakurê Kurdistanê, bidim ber şekirinê, ka di wan de çiqas "**Kurdên**" heye. Hikariya "**posîdeya**" zimanên hevser ên Turkan, Farsan û Ereban, bi ser de jî hikariya zimanên Ewrûpî ta çi pileyê di zimanê van nivîskarên hêja de çêbûye.

Bêguman ramiyariya nijadperest a van hevserên me yê, ku zora me birine, herifandinek saziyane di zimanê me de kirine, lê tiştekî seyr e, ku hikariya zimanên Ewrûpî li ser nivîskarên me ne ji ya van zimanên li çarexa Kurdistanê kêmtir e. Turkên, ku zimanê xwe wek royekê di nav zimanên din yê mirovatîyê de dibînin û pesin didin nekarî zora nivîskarên Kurd wek Ewrûpiyan bibirana. Farsên, ku zimanê wan xûşka zimanê Kurdên ye, dînsa jî nekarî bû wek yê Erebî, yê ji çolistana Hicazê hatiye, şaxên xwe berde nav zimanê Kurdên. Bo çi?

Ewrûpiyan bi pêşkeftina xwe ya nûjen, ku hemî acet û pêdakirinên şaristaniyê bi zimanên xwe dane nasîne û niha jî serkêşiya şaristaniya mirovî dikin, em bi zûkî xistin bin hikariya xwe ya zimanî û Ereban jî bi rêya zimanê Qurana pîroz û bi egera hevjiñek dirêj di şaristaniya îslamî ya, ku di dema geşbûna xwe de ne kêmtir bû ji ya Ewrûpiyan a niha, em xistin bin basikên zimanê xwe jî.

Bi ser van egeran de, dilxweziya me, ku em xwe li ba xwendevanê kurd, wek mirovên şareza hatîne Ewrûpîkirin bidin xuyakirin. Em ji xwe berê bûne hezkiriyên zimanên Ewrûpî. Ewê ku peyvên Ewrûpî naxîne nav nivîsa xwe, wek

gundiyekî, çolbirekî an gavanekî Çiyayên Zagrosê dixuye, lê gava ew li ciyê "**Sernûser**" hercar "**edintor**" binivîse, hîngê zana, pêşkeftî û çavrohn tê jimartin....

Min di bizava xwe ya lêkolînî da codanek kêşaye, ku tê de navê ١٩ nivîskarên bakurê Kurdistanê hene, li gel jêder û hejmara bêjeyên ne "**Kurdên**" yên, ku di gotarên wan ên, wek nimûne hatine berçavkirin:

Nivîskar	Jêder	Bêjeyên Erebi	Bêjeyên Ewrûpî
Haluk Öztürk	Dema Nû 10-16 Çiriya paşin 2005	20	20
Şakir Epozdemir	Dema Nû 10-16 Çiriya paşin 2005	33	01
Keya Izol	Peyama Kurd 25.02.2005	31	14
Kemal Burkay	Dema Nû 31 Tebax 2003	44	20
Zeynel Abidin	Dema Nû 16-22 Heziran 2005	23	06
Mehmet Eren	Dema Nû 31 Tirmeh 2003	38	02
Bedirxan Epozdemir	Peyama Kurd 11.03.2005	29	03
Ihsan H. Aydın	Dema Nû 12-18 Gulan 2005	30	05
Bayram Ayaz	Peyama Kurd 25.02.2005	23	12
Lokman Polat	Dema Nû 10-16 Çiriya paşin 2005	28	17
Sirac Bilgin	Azadiya Welat 05-11 Pûşper 1999	39	17
Casim Rênas	Dema Nû 10-16 Çiriya paşin 2005	11	07
Ahmed Zekî Okçoglu	Peyama Kurd 25.02.2005	20	11
Nejdat Buldan	Azadiya Welat 05-11 Pûşper 1999	28	09

Zeynel A. Kızılyaprak	Peyama Kurd 11.03.2005	21	06
Kadim Kan	Peyama Kurd 25.02.2005	26	20
Hesen Kaya	Azadiya Welat 05-11 Pûşper 1999	40	11
Mirhem Yigit	Azadiya Welat 24-30 Avrêl 1999	38	21
M. Kara	Dema Nû 31 Çiriya Pêşin 2003	19	06
Laleş Qaso	Peyama Kurd 31.12.2004	39	07
Latîf Epozdemir	Dema Nû 10-16 Çiriya paşin 2005	27	11
Mahmûd Kiliç	Dema Nû 31 Çiriya Pêşin 2004	31	15
Fadil Özçelik	Peyama Kurd 31.12.2004	19	10
Özgür Basut	Dema Nû 31 Tebax 2003	21	07
Dr. Cuwan Batu	Dema Nû 31 Tirmeh 2003	25	05
Navzat Karakeçî	Dema Nû 16-22 Heziran 2005	30	04
Bûbê Eser	Dema Nû 31 Çiriya Pêşin 2004	21	02
Ehmed C. Çamlîbel	Dema Nû 10-16 Çiriya paşin 2005	21	05
Ali Haydar Koç	Peyama Kurd 11.03.2005	27	09

Mixabin! van hêjayan hinde bêjeyên biyanî di gotara xwe de gelek caran bi kar anîne, ku van hejmarên li jor hatîne xuyakirin hîn bêtir dibin. Lê bêguman hinde gotar ji hev kintir an biçûktir in. Mijar jî sira xwe dilîze. Gava li ser gund hatibe nivisandin, bêguman wê ne wek mijara xebat û karên nêvneteweyî be. Di navbera herdu mijaran de nivîskar zimanê xwe jî diguhêre, bêtir bêjeyên biyanî bi kar tîne.

Bêjeyên biyanî yên, ku ji aliyê van hêjayan ve bi kar hatîne, di piraniyê de hevpar in, li ba van nivîskaran tevan bi kar hatîne... Çi Erebî bin û çi Ewrûpî....

Li vir jî pir giring e ku em bidin xuyakirin, ku tevî Farskirin û Turkîkiina civata Kurdên, di van sed salên dawî de, û bi taybet paş hatina Kemalîstan, dinsa jî bi kar anîna bêjeyên Turkî an Farsî, ji bêjeyekê an du bêjeyan di her gotarê de derbas nabe.. Eve jî pirsên din tîne holê....

Ji **Turkî** (*ancax, sirgun, derd, qereqol, êlçî, qelebalix, qatix, qalik, qoz*).... bêtir ji van bêjeyên, ku ez dizanim Turkî ne, bi ber çavên min neketin.

Ji **Farsî** jî (Newa, derheq, derfet, derya)....

Bêjeyên Erebî, ku bêtir bi kar hatîne, evin:

îddina, îspat, esil, tehdind, şêx, teslîm (teslîmiyet), resmîyet, şer, mesken, erd, sûk, hikûmet (hakim, mehkûm, hikm, hekim), îlan, dinya (dunya), însan, ihtîmal, qet, aqil, behs, îlm (alim, îlimdar, maalûm), siyaset, fêhm (fahm, mefhûm), selamet, silah (sileh), tamam, qebûl, heq (hiqûq), meqlûb, şîrket, tertîp, xerab (xirap), esîr, hîbr, dewlet, şert, qeyd, teref, dinn, muxalefet, wesîle, mana, safî, şewat, zulm (zilm, zalim), tifaq (itifaq, mutefîq), qal, tesawuf (sofî), Mentîq (Mintiq), Mentîqe, xeyb, wefat, hafîze (mahfûz, hifîz), hereket (tehrîk), şitexlî, heb, xizmet, îrşad, îzin, seyyid, tedrîsat (ders, medrese), ehl, tarîqet, sohbet, eman, biriqîn, madem, sekîni, dewam, sibat, zehmet (zehmetî), millet (millî), tedbîr, şidet, qewet (quwwat), hewandin, îmda (îmze), wezîfe, esas (esasî, esasen), fikir (fikirî,

tefkîr), hesab, mecbûr, ked, hal (halen), ferq, emr (mamûr), mesele, temsîl, saet, weqt, menzîl, ciddin, fedekarî, tercîh, Zihniyet, rehet, sebeb, tehemûl, daxil (mudaxele)....û hinekên din.

Bêjeyên Ewrûpî, ku bêtir bi kar hatîne, evin:

Reform, renosans tablo, ekole, akademi, trans, mîtolocî, arkeolocî, demokraî, teolocî, Îdeolocî, dinktator, milîtan, dialog, demogocî, pratik,antî, neo, sembol, kolonî, gerilla, qomsor, orijînal, super, partî, faktor, jenosîd, rêjîm, enerjî, plan, feodal, prensîb, objektîf, şoven, nasîyonalist, televisyon, rol, general, mekanîzm, doktrin, avantaj, model, arşîv, medya, form, interaktiv, polis, program, modern, stratêcî, kultur, milyon, traktor, politik, federal, veto, kart, stabil, ekonomî, kamyon, têrorîst, etnik, cografiya, Înstîtitut, sîstem, roman, romantîk, doktor, alkohol (berê ji Erebî hatiye), elektrîk, înstiyatîf, park, bank, mînbûs, provakativ, propaganda, problem, fobî, komisyon, metod, informasiyon, spîker, film, kontra, moral, erzyon, sosyalizm, kompiyoter, pakt, petrol, diplomatîk, pan, faşîzm, milîtarîzm, psikolocî, kapitalist, meeting, parlament, krîter, feks,şantaj, internet, trajêdin, komêdin, panorama...û hinekên din.

Gava Em bijmêrin, emê bibînin, ku kêmîtir ji 100 bêjeyên Erebî û kêmîtir 100 bêjeyên Ewrûpî derbasbûne nav van gotaran. Eve ne hejmarek mezine, lê gava di hinek gotaran da hinde bêje pir caran tîn, emê bibînin, ku zimanê tê herifandin. Tîstê diyar jî ewe, ku piraniya van bêjeyan bi Kurdên jî hene. Biraderekî bi xwe gotiye, ku peyva "Mirov" di zimanê Turkî da tuneye, lewra ewan "însan" bi kar tînin, mixabin, ew bi xwe jî di gotara xwe de "însan" li ciyê "mirov" bi kar tîne....

Ev bizava min a biçûk, dibe ku hinekan li xwe hişyar bike û bo hinekan jî deriyê lêkolînek firehtir û hêjatir veke....

Birêz Kreîm Perwîzî:

“YXDK Îranê dixwaze dengê fetisandî yê gişt xwandekarên Kurd di nava zanîngehên Îranê de bilind bike û xwandekarên azadîxwaz ên Kurd bi rêxistin û nasnameya xwe ya taybetî ve, di qada xebat û çalakiyên xwandekarî de xuya bikin”

Xwandevanên hêja, demekê berî niha Yekîtiya Xwandekarên Demokrat a Kurdistanê Îranê hate ava kirin. Lewma me bi hewce zanî ku em li ser girîngiya avabûn û armancên vê rêxistinê û herwiha xebat û çalakiyên vê yekîtiyê û herwiha helwestên wêderheq doza siyasî, civakî û pirsgirêkên xwandekarên Kurd di Îrtanê de, bi birêz Kerîm Perwîzî, Sekreterê Giştî yê vê rêxistinê re hevpeyvînekê pêk binin ku li jêr pêşkêşî we tê kirin.

Hevpeyvîn: Dara Natiq



Rêzdar Kerîm Perwîzî, ji kerema xwe di destpêkê de Yekîtiya Xwandekarên Demokrat a Kurdistanê Îranê pênas bike?

YXDK Îranê rêxistineke xwandekarî ye ku dixwaze xwandekarên Kurd yê zanîngehên Îranê û xwandekarên Kurdistanê Îranê, di jêr çetra xwe de kom bike û bibe çetra hevbeş ya xwandekarên azadîxwaz û xebatkar ên Kurd bona gehgîştin bi armancên xwe.

Hewcehî û sedemên pêkanîna vê rêxistinê çi bûn?

Tevgera Xwandekarî li du şêwe desthilat û sîstemên cur be cur de, du cure helwêstên cuda digire. Heke sîstema siyasî û civakî a welatekê demokratîk be, tevgera xwandekarî jî di vê sîstemê de helwêsteke rexnegir dibe, rexnegir bi vê wateyê ku nexwaze sîstemê biguhere, an jî guherînek bingehî tê de pêk bihê, belkî bi çavêkî tûj û bi hûrî xalên jar û xalên hêzdar ên civakê dibîne û wan xala destnîşan diket û bas diket, lê di welatekê de ku desthilateke dîktatorî bi ser civakê de zal e, êdî ew tevgera rexnegir nine, belkî pêkhatîkên e û heya wî çaxî ku guherîneke bingehî di sîstema siyasî û civakî



de pêk nehê, dê her dirêjîyê bide xebata xwe ya roşengeriyê.

Di Îrana li jêr desthilata reş û biyom a Welayeta Feqîh de, xwezayî ye ku ev bizava pêkhatîkên be, lê desthilata melayan pêşiya her cure rêxistineke rastîn a xwandekaran digirt û hinek rêxistinên destçêkirî û girêdayî bi raman xwe ava kirin.

Ji alîkî din ve, desthilat û piştî wê jî rêxistinên xwandekarî yên girêdayî bi desthilatê, çavê wan doza sereke a Îranê, ku pirsgerîka neteweyî ye nedidît û haşa ji maf û hebûna neteweyan dikir.

Li ber wan sedeman hewce bû ku rêxistineke rastîn a girêdayî bi desthilatê hebe ku xwandekarên Kurd li dora xwe bicivîne û ev xwandekarane bi şansa taybetî a xwe bêne nava qada çalakiyên xwandekarî.

Armanca sereke a YXDK Îranê çi ye?

Armanca sereke ya YXDK Îranê, pêkanîna organîzasyonê ye bona vê çendê ku xwandekarên xebatkar û azadîxwaz ên Kurd tê de xwe birê bixin bona

gihîştina bi hinek armancên wekî:

- Diyarbûna rola xwandekarên Kurd di bizava xwandekarî ya seranserî Îranê.
- Piştgîrî û beşdariya çalakane di tevgera neteweyî-demokratî a gelê Kurd de.
- Pêkanîna hevberî û harîkariya piratîk ya xwandekarên Kurd û tev xwandekarên neteweyên din ên Îranê.
- Beşdarîkirin di xebat ji bo avakirina sistemeke Federal di Îranê de.
- Cehd û hewildan ji bo pêkanîna têkilî û diyaloga bingehdar bi rêxistinên xwandekarî ên parên din yên Kurdistanê re.

YXDK Îranê heya çî radeyekê dikare bersivderê xwestek û daxwaziya îro rojê yên xwandekarên Kurd di Kurdistanê Îranê de be?

Di salên derbasbûyî de bi sedema zêdebûna rêjeya wergirtina ciwanên Kurd di zanîngehan de û sexmeratî hinek vekirîbûnê di rewşa siyasî de, liv û çalakiyên xwandekarên Kurd rû li zêdebûnê kir.

Xwandekarên Kurd yên di nava zanîngehên Îranê de ku di rêxistinên destçêkirî yên xwandekarî de, çî bersîvek bi pirsyarên wan nedihate dan, cehd dikirin ku bi çalakiyên teybet bi xwe, wekî derkirina kovarên Kurdî, avakirina Şewrên Xwandekarî yên Kurdan û... bi nasnameya taybetî ya xwe ve bihên nava biyava xebata xwandekarî û dengê xwe bigehînin xwandekarên din û xelkê, lê van cure çalakiyan bi destêwerdana rejîmê û zext û givaş xistina li ser xwandekaran nekarî ev hinde geşe biket, heya ku bikaribe hemû xwandekarên Kurd yên sertaserî Îranê li jêr çetrekê de li hev bicivîne.

YXDK Îranê dixwaze dengê fetisandî yê gişt xwandekarên Kurd di nava zanîngehên Îranê de bilind bike û xwandekarên azadîxwaz ên Kurd bi rêxistin û nasnameya xwe ya taybetî ve, di qada xebat û çalakiyên xwandekarî de xuya bikin.

Bi raya we erkê xwandekarên Kurd di qonaxa niha ya bizava rizgarixwaziya gelê Kurd de divê çawa be?

Bizava xwandekarî di rejîmeke dîktatorî a qorixçî de xwediyê girîngiyêke bingehîn e, ji ber ku ev bizava gişt damezraw û çavkaniyên kontîrol û dîsîplîna destvehatî ji aliyê rejîmê ve dixê jêr gilî û gazindeyên tund û radîkalane. Her wekî **Hana Artin** dibêje: "Ya ku takekesên vê nîfşê li her derê ji hêla navxweyî ve cuda diket, gernasî û vîna ciyê heyrîmanê ye ji bo egera pêkanîna guherînan". Erkê li ser milê xwandekaran û bizava xwandekarî ye ku hemû hewlên dîktatoran bi merema dûrxistina xelkê ji siyasetê di biyavên giştî ên civakê de pûç bikin.

*Navê mamostayê demokrasiyê,
şehîdê hertim nemir Dr. Qasimlo
mîna stêreke pir tîrêj di esmanê
buhagiraniyên modern û bilind û
mirovahiyê de dibiriqe.*

Di vê qonaxa hestiyar û dîrokî ya bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd de, erkê ser milê xwandekarên azadîxwaz û demokrat ên Kurd e ku bi hest bi berpirsyariya dîrokî a xwe, palder û texa pêşeng a xebata neteweyî-demokratîk a gelê Kurd bin û ji bo gihîştin bi armancên neteweyî û demokratîk ên gelê Kurd, bi rêxistina xwe mil bi milê tex û qatên din yê civakê xebat û tekoşînê bimeşînin.

Dîtingeha YXDK Îranê li hember xebata neteweyî-demokratîk a gelê Kurd di Kurdîstana Îranê de çi ye?

Em dikarin bizava rizgarîxwaz ya gelê Kurd li Kurdîstana Îranê bi du qonaxan parve bikin. Qonaxa yekem, em

dikarin bi qonaxa serhildan û rabûna gelê Kurd pênasê bikin ku li hember zîlm û zora desthilata navendî de serî hilda. Taybetmendiya berçav ya vê qonaxê eva ye ku bizava rizgarîxwaziya di vê qonaxê de bizaveke dijkiyar û berengarî ye.

Qonaxa duyemîn a vê bizavê bi avakirina komeleya **JK'ê** û hatina hinek ronakbîran bo nava qada xebatê, dest pê dike. Bi avakirina partiyeke serdemiyane û nûjen wekî PDK Îranê û piştî wê Komara Demokratîk a Kurdistanê di sala ١٩٤٥'an de, bizava rizgarîxwaz a gelê Kurd, şêweya bizaveke neteweyî-demokratî bi xwe ve digire. Ku cuda ji bersîvdana bi xwestekên neteweyî li pey bersîvdana bi xwestekên sereke û bingehîn yê mirov bi giştî û mirovê Kurd bi taybetî digere, ku xwe li şêweya xebat ji bo avakirina sistemeke demokratîk di civakê de nişan dide.

Di qonaxa xebata neteweyî-demokratîk de ye ku ev bizava diyardeyek jê çê dibe bi navê Bizava Ronakbîriya Kurd û di rastî de bizava ronakbîrî ji xebata neteweyî-demokratîk a gel ve çavkanî digire. Rêberên bizava ronakbîriya Kurd, xwendevanên Kurd û ew xebatkarane bûn ku ji aliyekê ve rêberiya xebata neteweyî-demokratîk a gelê Kurd dikirin, pêşengê xebat û şoreşê bûn, li pêşiya refa xebatkarên azadîxwaz de bûn û ji aliyekî din ve dixebitîn da ku çemk û wateyên modern di nava civakê de belav bikin.

Di nava vê bizavê de, navê mamostayê demokrasiyê, şehîdê hertim nemir Dr. Qasimlo mîna stêreke pir tîrêj di esmanê buhagiraniyên modern û bilind û mirovahiyê de dibiriqe.

Xebat û çalakiyên we di pêşerojê de wê çi bin?

Hewla YXDK Îranê eva ye ku ji rêya rêxistin û organîzekirinê ve, ew erkên ku bernamê û peyrewa wê diyarî kiriye, encam bide.

Hevpeyvîn ji Rojnameya Agirî ve hatiye wergirtin

Rêjîma Bees li Sûriyê diheje

CANKURD

Sûriye ji sala ١٩٦٤ê da, di bin destên partiya **Albaas Arabî Alîştirakî** de ye. ٤٢ sal e ku gelên Sûrî ji azadiya ramiyarî, demokrati û mafên mirov bêpar mane, bi taybet jî gelê me yê Kurd, ku nêzik % ١٧ ji teviya rûniştvanên Sûrî ye.

Di van ٤٢ salan de, bêkarî, belengazî û hejarî deh qatan ji berî destpêkirina deselatdariya Albaas bêtir bûye. Hem Mafiya aborî û hem jî ramanên terorî ciyê xwe di nav civaka Sûrî da girtine. Kuştin, lêdan, talankirin, dizîkirin, sextekarî û bedkariyên cur be cur pir belav bûne. Çinên binî bêtir ji ber zorbaziya Partiya Albaas dinalin. Ev jî egerek ji wan egeran bû, ku bi hezaran ciwanên Kurd, çî mêt û çî afret, ber bi PKK we meşyan.

Li Sûriyê, di bin zordariya Beesiyan da, du serhildanên xwinî çêbûn, yek di dema **Hafêz Alasad** da û yek jî di dema kurê wî **Beşşar Alasad** da. Di sala ١٩٨٠'ê da, ku jê re dibêjin serhildana Îslamî ya **Ixwan Muslimîn** çêbû. Di wê serhildanê da bêtir ji ٥٠.٠٠٠ mirov hatin kuştin. Parek ne biçûk ji wan kuştîyan li bajêrê **Hema** bû. Li wî bajêrî jî gelek êlên Kurdan ji dema **Eyûbiyan** ve bi cih û war bûne. Malbatên wek **Berazî, Silo, Qadir Axa, Zaim** û hinekên din Kurdin. Du rêberên tewr mezin ên Ixwan Muslimîn jî hîngê Kurd bûn, yek ji wan mejiyê wan û niviskarê navdar **Said Hewa** û yê din birêvebirê tevgera wan ê bi navê **Ednan Saadidîn**. Ji malbatên **Silo** û **Berazî** wezîr û serekwezîr jî pêda bûne û ji malbata **Zaim** Serok Komar **Husnî Zaim** hebû. Serhildana din sala ٢٠٠٤'ê di ١٢ê Avdare de çêbû. Ew serhildanek neteweyî bû. Ya gelê Kurd bû. Ew li tevahiya herêma Rojavayê Kurdistanê belav bû. Ji ber wê jî gelek Kurd hatin girtin, binzorkirin, lêdan û kuştin. Ji wê demê ve jî neyaritiya deselatdariyê bi gelê Kurd re hîn ji berê mestir bûye. Mixabin hinek baskên tevgera neteweyî ya gelê Kurd di vê serhildanê da û paş têkçûna wê, bûn

alîkarên dewletê û be bi destxistina tişteki berçav deselatdariya dewletê di herêma Kurdî de ji nû ve hat bi cihkirin û ew serhildana pîroz wek "fitne" hat bi navkirin. Kesekî wek **Şêx M. Xeznewî**, ku piştvaniya serhildanê kiribû, hat kuştin.

Serokê Sûriyê yê niha **Dr. Beşşar Alasad** di ٢٤ saliya xwe da bû Serokê Komarê, ciyê bavê xwe bê hilbijartin girt. Ji bo rêbazkirina vê neqenciye, destûra dewletê di zikê saetekê da hat guhartin. Ev kes e dema bûye serok, soz bi devê xwe da gelên Sûrî, ku ewê deriyê welêt bo bayê teze veke, rêformên aborî û ramiyarî çêbike, bedkariya karmendên dewletê tune bike û wê Sûriyê bigihîne qonaxek nû, ku tê da mafên mirov, azadiyên ramiyarî û azadiya aborî bèn parastin. Ji van sozan ta niha tişteki bi cih ne hatiye. Ew "**Behara Şamê**", ku demekê paş destpêkirina serokatiya **Beşşar Alasad** kintirîn behar bû di dîroka mirovatiyê da. Niha gelek rêber û pêşengên demokrat û kesên li mafên mirov xudan derdikevin girtine, ji zû ve di zindanê da ne. Ji wan yek profêsoorê aboriyê yê navdar e, **Arêf Delîle**, an jî andamên **Encumana Gel** in wek **Riyad Sêf** û **Mamûn Humsî**...

Di **Lubnanê** da, leşkerê Sûrî gelek salan ma. Ew leşker li gor peymanana "**Altaêf**" bo rawestandina cenga Lubnanî derbasî wir bû. Lê rast ev leşker bi karên nebaş di Lubnanê da rabû. Ew bû leşkerê talankirin û binvekirina gelê Lubnanî. Bêtir ji ٢٠ salan Sûriyan di Lubnanê da zordariya dewletê birîbû û pir kesên ji vê yekê hosan bûbûn dane kuştinê. Gelê Lubnanê nema pêvegirêdana welatê xwe bi Sûriyê ve dipejirînan. Pir kesên, ku li ser vê yekê nivisandine an nerazîbûna xwe anîne zimên an dij bi hebûna leşkerî ya Sûrî di Lubnanê da xebitîne, hatine windakirin, girtin û bersûckirin. Li vê dawiyê serokwezîrê Lubnanî **Refiq Herîrî**, ku malbatek navdar bû, bizava xwe bo pêdakirina livek civakî, çandeyî û aborî-ramiyarî kir, dij bi hebûna Sûriyê di nav çavên gelê wî da. Ew li gel ٢٢ kesên din bi livbaziyek terorî ya kirêt hat kuştin. Berî kuştina wî

Beşşar Alasad bi xwe gef û gurr dabûn wî û gotibûyê:
"Ezê Lubanê di seriyê te da bişkinim."

Encumana Hêminiya UNO biryarek bi hejmeta ١٠٠٩ derxist, ku hebûna leşkerî û îstixbaratî ya Sûrî li Lubanê nemîne û di warê kuştina serokwezîrê Lubnanî **Refîq Herîrî** da lêkolînek fireh çêbibe. Ew kar dan dest dadkarê Alman **Detlef Mehlis**, ku kesekî di van kar û baran jêhatî û zîrek e. Li ser rapora wî ya, ku ji ٥٨ rûpelan e, gelek guman li ser Sûriyê pêdabûne. **Mehlis** di rapora xwe navên mezinên dewleta sûrî tîne zimên. Di wê ortê da wezîrê hindîrî yê Sûriyê, ku berê deselatdarê rastîn ê Lubnanê bû, General **Ghazi Kanaan** jîna xwe ji dest bir. Kurê wî yê, ku li Amerîka dijî, daxwaznameyek bo lêkolînê li ser mirina bavê xwe daye dadgehê, ew guman dike, ku bavê wî jî hatiye kuştin. Di nav navên, ku Mehlis dixwaze wan bibe Lubnanê û jêpîrsînê li gel wan bike, zavayê **Beşşar Alasad (Asif Shewket)** heye û serokê îstixbaratê **Rustem Ghazalî**, ku dibêjin ew Kurd e. Evana li gel birayê **Alasad (Mahêr)** du stûnên bi hêz in di rêjîma Sûrî da. Heger evana bikevin, deselatdariya **Alasad** jar dibe.

Beşşar Alasad di axiftina xwe ya dawî da, roja ١٠.١١.٢٠٠٥, da xuyakirin, ku ewê li gel **Mehlis** li gor biryarên UNO ١٠٠٩ û ١٦٣٦ kar bike, lê ew seriyê xwe naçemîne, ewê berxwedanê li hember Amerîka, Israîl û dewletên din bike, ew nahêle, ku kesek destê xwe deyne ser Sûriyê, û di axiftina xwe da gef û gurr dan Lubnan û Saudî Arabistanê, piraniya hembervaniya Sûrî wek ajan û sîxurên biyaniyan bi navkirin. **Dr. Kamal Libwanî**, ku yek ji demokratên nas e û li Amerîka li gel hinek berpîrsên ferdandariya Amerîkî re rûniştibû, gava li firgeha Şamê peya bû, hate girtin. Berî wî jî **Haytham Almalêh**, ku berpîrsê xebatên mafên mirov e li Sûriyê dan ber dadgeha leşkerî. Mafparêz **Anwer Albunni**, ku destûrek nû ji bo Sûriya paş **Asad** û paş **Baas** amade kiriye û tê da li ser mafê gelê Kurd jî rawestiye, ji trumbêlê hat avêtin û bi hovîtî li wî dan, birîndar kirin û li

kenarê rê hêştin. Gef û gurr bo demokratên Kurd û Ereb ên li derveyî welêt roj bi roj bêtir dibin. Li hindir welêt komikên dij bi rêjîma **Baas** pêtir û hêzdartir dibin. Gelê Sûrî, ku rewşa wî ber wêranî û herifînê diçe, nema ditirse. Lê mixabin! Piraniya partiyên Kurdan bi hembervaniya Erebî ya nijadparêz re li ser bingeha kêmtirîn maf ji bo Kurdan dixebitin, newêrin dev bavêjin rêjîmê û her dibêjin, ku dem nehatiye. Hinek komik jî roxandina rêjîma **Baas** dixwazin. Van du xêzên ji hev cihê roj bi roj diyardir û zelaltir dibin. Li aliyekî mamhoste **Hemid Hac Derwêş** seriyê dîlana sist û nerm dikişîne û ji aliyê dî ve **Partiya Demokrat a Kurdistan – Sûriye** li gel hinek komikên Ereban têkiliyan li gel USA û EU çêdike û dibe alîgirê guhartinekê li Sûriyê. Li Washington, Brüssel, Berlin û Parîs bo vê guhartinê civînên hembervaniya demokrat a Sûrî çêbûne. Di van kongireyan da mafê gelê Kurd weke neteweyek serekîn di Sûriyê de hatiye pejirandin.

Bêguman tevgera neteweyî ya parçeyên dî yên Kurdistanê dikare van herdu seriyên dîlana Kurdî ya Rojavayê Kurdistanê berhev bîne, gava platformek neteweyî ya Kurdî ji bo Rojavayê Kurdistanê çêbibe. Lê berî her tiştêkî divê em tev bawer bikin, ku êdî keştiya **Baas** li Sûriyê jî hatiye kunkirin û bi binve diçe, hîvî di vê deselatdariyê da nemane û paş ٤٢ salan ji têkilî û gengeşiyê bi vê rêjîmê re, êdî rûn bi ser dewê van **Baasiyan** nakeve. Heger ev bawerî li ba hemî basikên tevgera me ya Rojavayê Kurdistanê çênebe, berhevhatina rastîn jî bi cih nayê. yekbûna partiya **Azadî** ya nû pêda bûye û ser ji nû ve parçebûye vê rastiyê bi cih dike. Gelek roşenbîrên Rojavayê Kurdistanê jî gihane vê rastiyê û niha jê re dixebitin.

*Divê em qedera gelê xwe bi rêjîmek ve girê nedin,
ku ber bi têkçûnê ve diçe.*

Nivîskar Şehab Xalidî:

“YÊN KU DR. QASIMLO XWE RE BİKNE SEMBOL, YÊ HÎNÎ EXLAQ DÎ SIYASETÊ DE BÎN”

Xwandevanên birêz, çend rojan berî niha pirtûkek li jêr navê “*Dr. Qasimlo banga aşti û azadiyê*” ji aliyê hevalê şorişvan û pêşmergeyê xebatkar yê PDK Îranê birêz *Şehab Xalidî* ve kete ber destê xwandewanan. Me jî bi hewce zanî ku di vê derheqê de bi wî re hevpeyvînekî pêk bînin heya ky xwandevanên vê pirtûkê zêdetir li ser naveroka pirtûka wî û çavaniya berhevkirina vê pirtûkê agehdar bin.

Hevpeyvîn: Nûredîn SOFÎZADE



Rêzdar kekê Şehab Xalidî di destpêkê de ji kerema xwe vê pirtûkê bi xwandevanan re bide nas kirin?

Navê pirtûka min Dr. Qasimlo banga aşti û azadiyê ye. Min ev pirtûka pêşkêş kiriye bi malbatên birûmet yê giştî şehîdên rêya rizgariya Kurd û Kurdistanê. Di rûpela yekemîn de pêşgotinek heye, piştî vê di rûpela 1’an de min destpêkek ji pirtûkê re daniye. Û mijarên vê pirtûkê evên jêrîn in:

- Jînenigariya Dr. Qasimlo
- Şîretên Dr. Qasimlo
- Gotinê binirx yê Dr. Qasimlo
- Dr. Qasimlo û bizava azadîxwaziya Kurdistan
- Dr. Qasimlo û bizava seranserî ya Îranê
- Rolê Dr. Qasimlo di PDK Îranê de
- Hevpeyvîna Dr. Qasimlo bi veşana “Rahê Eranî” re
- Hevpeyvîna Dr. Qasimlo bi Radyo BBC re
- Kurdistan û Kurd
- Kurtebas
- Kul û kovaneke mezin
- Şehîdbûna Dr. Qasimlo ji zimanê kesekî ve ku bi çavên xwe cîyê bûyerê dîtye
- Bûyera Viyenê
- Gotinê dawî yê Dr. Qasimlo
- Rê û resma bi axê sipartina şehîd Dr. Qasimlo
- Peyama Dr. Seîd Şerefkendî seba şehîdbûna Dr.

Qasimlo

- Li ser gora şehîdan
- Dr. Qasimlo berbjarê xelata Aştiya Nubêl
- Yad û bîranîna Kongireya Qasimlo
- Dr. Qasimlo ji dîtingeha kesatîyên siyasî ve
- Helbest
- Wêne

Merema te ji nivîsandina vê pirtûkê çi bû?

Berî her tiştî ez vê yekê bêjim ku min ev pirtûka berhev kirye, min nenivîsandîye. Di rastî de, dema ku min didît gelê me xwediyê rêberekî wiha giranqedir e, lê mixabin heya niha çi pirtûk li ser nehatine nivîsandin, ez pir heyrî dimam. Hekî Dr. Qasimlo rêberekî Kurd neba rêberê her neteweyekî din ba, bê şik û guman renga hetanî niha li ser kesayetiya wî aliyê kêr bi dehan pirtûk yê bihatibana nivîsandin. Vê yekê şev û rojan mejiyê min dabû ber pêlên xwe û ez bi xwe ve mijûl kirim. Lê mixabin ez ne nivîskar bûm û ne jî niha nivîskarim ku min pirtûkek li ser kesayetiya kesekî wiha mezin binivîsandiba, lewra min biryar da ku tewahiya cehd û tekoşîna xwe bi kar bînim heya ku bikaribim pirtûkekê berhev bikim. Yanî jînenîgariya wî, gotinê wî yê bihagiran û şîretên wî û... li ser hev bikim pirtûkek û sibê rojê bişinme nava gel de. Bi keyfxweşî ve di vî karê xwe de ez serkevtî bûm. Helbet vê yekê jî bi bîr bînim ku min heya niha tenê pirtûkek dîtiye ku li ser Dr. Qasimlo hatibe nivîsandin, ne eva ku hatibe amade kirin, ku ev jî ji aliyê parlamantêrekî xwedî nifûz yê Utrîşî bi navê Pîtir Pîlç ve hatiye nivîsandin, ne ji aliyê Kurdekî ve. Lê ev jî min taze çend roja berî niha dît ku tercumana wê gihişte destê min.

Jêder û çavkaniyên ku te mifah jê wergirtin çi bûn?

Min bo berhevkirina vê pirtûkê zortir ji **Rojnameyên Kurdistan**, Organa Komîteya Navendî a PDK Îranê mifah wergirtin, piştî vê min ji Dîroka PDK Îranê yanî **Niw Sede Têkoşan**, Pirtûka **Seferî Bêgeranewe**, ji hinek boltenên


xeberî, ji pirtûka bi nav û deng ya Dr. Qasimlo **Kurdistan û Kurd** û ji namîlkeya **Basekî kurd li ser Sosyalîzmê** mifah wergirtin.

Tu çi qas pêve bûyî heya ku te ev pirtûk berhev kir?

Di rastî de ez heyamekî zaf bi vî karî ve mijûl bûm, dikarim bêjim çend sal bû. Ji berku ev çavkaniyên ku min mifah jê wergirtin pitir bi zaravayê Kurmanciya jêrîn bûn yan jî Farsî bûn. Diviya min jî ev gişt wergirandibana ser zaravayê Kurmanciya Jorîn. Dîhare vî çaxî karê wergirandina min ne baş bû û heya wî çaxî ku hevaleyê min di karê wergirandinê de pitir hevkarîya min kir, hingê min zanî di karê wergirandina min de çi qas şaşî hene. Ev jî cenabê te bû, kekê Nûredîn Sofizade. Heya ku carek din min şaşiyê ve pirtûkê serast kirin wextekî zaf pê çû. Helbet ez pir mandî bûm lê niha ku ez berhema zehmeta xwe dibînim mandî bûn gişt ji bîra min çûye, bi taybetî ev pêşwaziya baş ya hevalan ji vê pirtûkê bi tewahî ez dilxweş kirim. Ev mohebeta wan zêdetir min hay didin bona xizmet kirin bi gel û nîştiman.

Erê gelo piştevan û hayderên te di vî karî de kê bûn?

Zaf hevalan hevkarîya min kir. Ev pirtûk tenê berhema mandîbûna min nine, hekî zehmeta hevalan nebûya ez di vî karê xwe de serkevtî nedibûm. Lê çend keseka rolê esasî hebûn di vî karî de ku hewceye ez yek bi yek sipasiya wan bikim. Di rastî de di çapa vê pirtûkê de şaşiyek çêbû, yanî di wê rûpelê de ku min navê wan hevalan nivîsandibû. Hewce ye ku ez daxwaza lêborînê ji wan dikim. Yê ku karê pêdeçûnê girte sitûyê xwe, birêz Nûredîn Sofizade bû, birêz Dara Natiq karê montajê kir, kekê Şefîi Rewşenî rûbergê pirtûkê çêkir, kekê Omîd Esxeran karê taypê kir û kekê Rezaq Moradîazer jî hetanî bi dawî hatina karê pirtûkê kompêtera xwe danî xizmeta min de. Ez sipasiya wan hemîyan dikim, ev pirtûk ne tenê ya min e, belkî ya tev hevalan e.



Armanca te ji berhevkirina vê pirtûkê bi pîtên Latîni çî bû?

Berî her tiştî ez vê yekê bêjim ku bi kar anîna pîtên Latîni di destpêka sala 1930'an de dest pê kir û yên ku hewl dan bona pîtên Latîni, Celadet Bedirxan, Morgolof, Tofîq Wehbî û Cemal Nebez bûn, lê ya Celadet Bedirxan cihê xwe girt. Di rastî de piraniya Kurdan bi pîtên Latîni dinivîsînin. Min di qonaxa yekemîn de ev yeka berçav girt ku Dr. Qasimlo tenê rêberê PDK Îranê nine, belkû rêberê gelê Kurd e, lewra piraniya Kurdan ku bi pîtên Latîni dinivîsînin pîtên Erebi bi kar naynin, heki ev pirtûk bi

Latîni be evê gişt bikaribin bi xwandina vê pirtûkê pitir vî rêberî nas bikin. Ez dixwazim di vira de behsa nimûneyekê bikim. Pêştir PDK Îranê tenê Rojnameya Kurdistan hebû, piraniya Kurdan ku li ser PDK Îranê çî hajayîyek nebûn an jî bi kêmi hajayî hebûn, dema ku PDK Îranê biryar da rojnameyekê bi navê **AGIRÎ** bi pîtên Latîni biveşîne, PDK Îranê li derwey welat di nava wan kesên ku bi pîtên Latîni dinivîsin rihekî taze girt. Xelkekî zaf li rêya Rojnameya **AGIRÎ** ve bi PDK Îranê re nasyar bûn. Zaf ji siyasetvan û zimanzanên bi nav û deng ji rojnameyê re E-Mail hinartin û keyfxweşiya xwe seba vê pêngav hilgirtina girîng û dîrokî ya PDK Îranê dane eyanê û bi xwe jî qala vê yekê kirin ku wan zanyariyê zêdetir li ser PDK Îranê nebûn. Lê niha ew vê partiyê çêtir nas dikin. Di qonaxa düyemîn de min ev yeka berçav girt ku heki sibê rojê zimanekî îstandard yê Kurdî pêk bihêt bê şik û guman divêt me yek rênûs hebe. Yekbûna rênûsa Kurdî şerta bingeîn e bona îstandard kirina zimanê Kurdî, lewra ev arîşe divêt bête çareser kirin. Heki rênûsa me bi Latîni be em dikarin xwe bi cîhana pêşkevî ya rojava nêzik bikin û bikevne nava têkiliyan de, rojavayî niha bi latîni dinivîsînin û dixwînin, çima em jî rênûsa xwe nekin Latîni? Çimku wê demê ew jî dê bikarin zimanê me hîn bibin. Ataturk dema xwe zîrekati kir û her zû dest kir bi cihgir kirina pîtên Latîni di devsa pîtên Erebi de û xwe li jêr bandora pîtên Erebi de derxistin, niha wan çî arîşeyê rênûsî bi cîhana rojava re ninin. Pareke zaf ji Kurdan di Kurdistanê Turkiyê de dijîn, heki sibê rojê Turkiye bibe endamê Yekîtiya Ewrûpayê wî çaxî Kurd bi şeweyekî otomatîk dikevne nava Yekîtiya Ewrûpayê de. Yanî beşeke Kurdistanê dikevne nava Yekîtiya Ewrûpayê de û sînorê di navbera Kurdistanê Îranê û Turkiyê, dê bibe sînorê navbera me û Ewrûpayê. Ev sînor dibe sînorekî sitratêjîk di warê tecaret û bazerganiyê, dibe sînorekî pir girîng ku dê bibe sebebê geşekirina Kurdistanê di hemî warî de. Lewra bikaranîna van pîtan dikare rolekî zêdetir bide Kurdan di hevkeseyên siyasî di

herê mê de. Ez dixwazim ji bo selmandina gotinê xwe qala bîr û raya hin pispor û şarezayan di vê derheqê de bikim.

Şehîd **Dr. Qasimlo** bi xwe li ser vê bawerê bû ku: "Pîtên Latîni bona nivîsandina zimanê Kurdî ji hemiyana baştir in. Zimanê Kurdî heya qasekî sanahî ye hekî pîtên Latîni bihêne bi kar anîn, nexwandewarî yê zûtir ji nav here û bîhanî jî yê zûtir zimanê me hîn bibin.

Herwiha **Tomabiwa** di pirtûka **Jiyana Kurdewarî** de dinivîse: "Kurdên Ermenistanê di destpêkê de bi pîtên Latîni nivîsandine, tenê hindê guherîn di pîtan de pêk anîne ku ev jî berî şerê cîhanî yê yekemîn bû û elfabê ya **Sirîlyek** tevî wan pîtan kirine lê her çavan be nivîsandin bi pîtên Latîni sanahîtire ji pîtên Erebi, herwisane tê çavniherî kirin ku tewahiya Kurdan bona bi kar anîna pîtên Latîni cehdê bikin. Çimku xwandin û nivîsandina vê ji zarokan re sanahîtir e, û herwiha guherîna pîtên Eerebi bi pîtên Latîni yekbûna ziman sanahîtir diket.

Erê gelo ev karê te heya çî qasekê wê bikare bandora xwe hebe li ser ciwan û xebatkarên welatê me?

Bona vê ku tev xortên welat hewayê azadî û serbestiyê hilmijin û li jêr vê rewşê û hewayê azadiyê de xizmetê bi niştîmana xwe bikin divê şîretên bihagiran yê rêberê xwe bixûnin û ji wan şîretan dersê wergirin, û wek wî xwe pêbigehînin bona pêşeroja welat, çimku wî xwe pê gehand bona xizmet bi gel û welat. Ev ciwan û xebatkarên ku Dr. Qasimlo ji xwe re bikne sembola, yê hînî exlaq di siyaseta de bin, yê fêrî demokrasiyêke rastîn bin, yê fêrî diplomasiyekî baş bin, yê bibne kesayetiye derce bilind, yê bibne ziman zan, yê bibne şorişvanên dilsoz û evîndarê ax û welatê xwe, yê fêrî şoriş û berxwedaniyê bin, yê bibne rêvîngê rastîn yê rê û şopa Dr. Qasimlo, yê dirêjîderê rêka wî bin û eva ye xelata herî baş bo şehîdan.

Rêzdar kekê şehab gelek sipas ji bo te ku te dema xwe bi me re veqetand?

Zor sipas bo we ku we ez bi ser kirim.

Osman Rajanî

Di gel wizîna dengê ba
 Tevî haşe haşa rûbarî
 Di gel bêdengiya şevak
 Ku şikyaye bi yekcarî
 Dengê hate guhê min da
 Dengê xweşî û evîndarî
 Gotin jî dayk bû kurek
 Ronahî kir şeva tarî
 Zor dirêj e xelas nabe
 Nizanim bo çî ev şeve
 Lê korê bîm min nezanî
 Ev şeve çiqas bedev e
 Bişkivî di vê şevê da
 Heyva me ya çarde şeve
 Şeva Yelda gelek ron bû
 Bûye dîroka netewe
 Di vê şeva pir dirêj da
 Hat donyayê pêxemberek
 Pêxemberê azadiyê
 Ku aştiyê bîne her derek
 Bigirin şahî û govendan
 Pavêjin hemî keserek
 Wek wî aştiwxaz dê kê be
 Nahên wek wî çî rêberek
 Navê ewî pêxemberî
 Ebdulrehman Qasimlo ye
 Ji destpêka jiyane da
 Alîgirê aştiyê ye
 Qasimlo dibêje azadî
 Aştî nişana jiyane ye
 Şeva Yelda bi wî ezize
 Qasimlo jê peyda bûye

Pêxemberê Azadiyê

Min got neçe ji te re,
Nebe bi xwe re kêf û nalînên min.
Tu nikarî hilgirî, ez te nas dikim,
Tu zû ditengizî, nikarî li hember pêlan,
Nikarî li hember lehiya hestan, direvî.
Min got ji te re, nebe bi xwe re,
wan bargiraniyan,
Wê ew bibin tacek ji berfa hemdemîn,
Xwe bidin serê te û tê de wê qeşa bigirin hestên min.
Agirî,
min got ji te re,
tu ne berenberî Agirî yî.
Xwe ewqas mezin,
zirav û
dirêj neke.
Bikî nekî serê te nagihe ewran.
Divêt tu li ber û pêşiya xwe binihêre.
Kesek silavek jî li te nake,
Heger ne evîniya min bî ji xwe tu xuya nakî.
Tu di kirasê min de yî dema mirov ji te re dikenin.
Tu yê di kadîna kulên min de rakevî,
Tune cîh û livîn ji te re.
Tu yê têkevî tora wan zindî an jî miriyên zagonan,
Wê te bêxwedî, perîşan û tenê bikin.
Neçe min got ji te re
û
binpê neke van bîranînên me yên rengîn.
Ewên ku her yek wê bibûna zarokeke rûgeş ji me re.
Tewanbariyan nede piştta xwe min got,
Nebe jankujê janvejînan.

Ji henga ku tu ji kirasê min derketî yî.
Dizanim, li te sar e,
Tu dicemidî, belkî jî diqerisî,
Dixwazim dîsa çakêtê xwe biavêjim ser milên te.
Te biparêzim,
germ bikim,

NEÇE



BERÎ BUHAR

bi hilmên xwe yên şîloz.

Min got neçe,
tu yê bêriya min bikî.
Tiştekek pîs e tu zanî bêrikirina min.

Kirasê min jî stûxwar e bêyi te,
Nema tê şuştin, ûtîkirin.
Reng û rû jê çûye, qermiçiye.
Min dizanîbû ku tu herî,
ezê bi tenêbûna xwe vebim.
Nû bi rengê rûyê xwe hisiyam.
Diran...
Diranên min zer, neynûkên min dirêj,
Çavên min tijî şîqal in.
Min nizanîbû ku heya neha neynik,
Dixapînin çavên min.
Nemaye xweşî û aramî,
Dicemidim,
li min sar e,
Li germahiya te digere laşê min.
Di tunebûna te de li wateyan digere,
Her beyarî û xizanî dertên, ji xewnên şevan
Balivê min nema weke pêmbû
lê weke guran tê rûyê min,
Nema laşê min germ dibe bi wê mitêla hirî,
Nikarim li xwe deynim, zor e
lê
Yê ku bêwate bû ez bûm li cem te.

Min got ji te re neçe,
Ezê bêriya te bikim, ku tu herî,
Nikarim li xwe deynim, zor e,
Lê...Tiştekek gelek pîs e bêriya te kirin...



Westiyam
Çoçê min pîç bîn
Di bin vê valahiyê de
Qorê zorên
Li ser mijankê min
Sema dîkin
Valahî çavê min dadîgire
Şavê min valahiyê
Di rezîka xwe de vala dîke
Pîncarê bestê min dinale
Li ser sitrana
Gorên bê kêl
Pêre tenbûra
Pêlên keserê
Di çavê min de
zewbuhêrkan dimeyîne .

Gir

Festîvala Kan ya sînemayî

Luqman Ehmed
 Luqman9VT@hotmail.com



Her sal di ١٣'ê Eyarê de li Ferensa , bajarê Kan (Canns) festîvala sînemayî dest pêdike weke kombûneke cîhanî taybet û berdewam dike ta du heftiyên di navbera pêşandin û nêrx û rexin û hevnasîna ekter û cemawerên sînemayî di hundurê Qesra festîvalê de.

Bajarê Kan (Cann) li rex bajarê (Los Anglos) serokatiya festîvalên sînemayî yê salane li cîhanê dikêşîne.

Çiroka festîvalê destpêdike di sala ١٩٢٧'an de dema ku sînemayên hindê welatên cîhanê li paytexta Ferensa (Parîs) hatibûn kom kirin û berhemên xwe dabûn pêşandin, ji ber wê jî wezareta rewşenbîriya Ferensa biryareke fermî dabû bi derxistina xelateke hunerî li jêr navê (Mezintirîn xelata sînemayî). Hevdîtina ١٩٢٧'an gelek derî li pêşiya rewşenbîr û hunermenda vekiribû û pişgiriyeke mezin ji aliyên fermî hate dan.

Ferensa xwe di aliyê sînemayî de, beranberî El-Bundiya û Biroksilê didît ji ber wê jî piştî festîvala Îtalî a sala ١٩٢٥'an, dest bi Kan dikir û pêşengê sînemayî (Liwî Lombêr) hate helbijartin ji serokatiya wêrê. Lê mixabin şerê cîhanê yê diwimîn dest pêdiki, ji ber wê jî festîval hate rawestandî heya sala ١٩٤٦'an di ٢٢ Eylûlê hate bikaranîn bi piştgiriyeke mezin ji aliyê hikûmeta Şaril Dîgol ve. Li wirpêde berdewam bû her salê carekê ji bo helbijartin û rêzgirtina hemû berhemên hunera sînemayî.

Festîvala Kan çiyê?

Kan bi xwe wek bêjîngê ye di helbijartina berhemên sînemayî de dibin şert û mercên xweyî zor de ji ber mebesta wê ya serkî mebesteke hunerî û kultûrî ye ji derveyî Aydyolociya ye, herdem ji bo avakirina mirovatiyê û wekhevîyê ye di navbera kultûra miletan.

Her sal li nêzîkî (٢٥-٤٠) filimên dirêj li kêleka (٢٠-٥٠) filimên kin, beşdarî festîvalê dibin. Komîteyên helbijartinê ji du beşan pêk tê, yek ji wan ji ١١ endaman pêk tê ji bo helbijartina filimên dirêj û ya din ji bi ٥ endaman ji bo helbijartina filimên kin pêk tê.

Endamên van herdû komîtan ji kesên pispor di warê rewşenbîriya cîhanî de, xwedan nêrîn û bawer pêk têt weke: (Can Kokito, Marsîl Baniyol, Endirê Morwa....)

Xelata zêrîn tê dan li ser baştirîn sînyaroyan yan dîkor yan jî mosîqa û nîgar, ji sala ١٩٦١'an de xelata bi navê hunermendê Emrîkî (Garî Kober) tê dan.

Piştî sala ١٩٦٨'an gelek çalekiyên din li tenîsta festîvalê hatine bikaranîn, weke: Heftiya derhîneran, heftiya rexnevanan....

Xelata Kan tiştêkî **watedariye** piştî xelata Oskar ya Holyoodê simboleke mezin e ji diyaloga kultûrî ya di navbera mirovan de.

Kan ew pencer û bazirganiya ku berhemê miletan tede belav dibin ber bi radeyê berfireh di jî tarî û perçandina kultûr û nasnameya miletan e, li Kan me Yaban û Yogsłaviya (berê), Polonya, Çîn, Îran, Kurdistan, Cezayir û Emîrîka û... nasdikir û bi şêweyê bilind û pak dane ber çavên hawelatîyên Ewropa û hemû dinyayê û... Çawa filim dibe belgenemeya mirovan, weke ba sînoran diçirîne.
